

‘Dermanên penceşêrê di nexweşxaneyê de pir kêmbûne’

Solîn Mihemed/ Qamişlo

Rêveberê Beşa Telasemiya û Penceşêrê ya Nexweşxaneyê Heyva Sor a Kurd Ehmed Hacı diyar kir ku ji ber kêmbûna dermana rewşa nexweşên penceşêrê nebaş e û got, “Ji 25 cure demanên kîmyawî, tenê 5 cure li cem me maye.”

Nexweşxaneyê Heyva Sor a Kurd li Rojavayê Kurdistanê yekem nexweşxaneyê ku tê de beşek ji bo nexweşiyên penceşêrê hatiye vekirin. Lê di dema dawî de ji ber êriş û dorpeça li ser Rojava pêdiviyên nexweşxaniyê bi taybet dermanên penceşêrê pir kêmbûne, lê tevî wê jî nexweşxaneyê nexweşan pêşwazî dike. Di derbarê mijarê de rêveberê Beşa Telasemiya û Penceşêrê ya Nexweşxaneyê Heyva Sor a Kurd Ehmed Hacı ji Rojnameya me re axivî.

‘Nêzî 805 nexweşên penceşêrê di nexweşxaneyê de tên dermankirin’

Ehmed Hacı diyar kir ku di dema heyî de nêzî 805 nexweşên penceşêrê li Nexweşxaneyê Heyva Sor a Kurd tên dermankirin û wiha got: “Ev nexweşxaneyê me, yekem nexweşxaneyê ku li Rojavayê Kurdistanê bi beşekî penceşêrê hatiye vekirin. Ji destpêkê de û heya niha nêzî 805 nexweşên penceşêrê li

nexweşxaneyê xwe tedawî kirine. Bi taybetî di dema dawî de ji ber rewşa ku çêbû nexweşan nikarîbûn berê xwe bidin Şamê û xwe tidawî bikin, di heman demê de tu cihê din tune ne ku nexweşên penceşêrê berê xwe bidê nê, lewma wan berê xwe dan nexweşxaneyê Heyva Sor A Kurd. Ji bo nexweşiyên penceşêrê gelek tişt pêwêstî, lê defetên me tune ne ku em peyda bikin. Tiştê ku ji me tê em dikin û bi nexweşan re dibin alîkar. Rojan e ji 20 heya 40 nexweşî serdana nexweşxanê dikin. Lê dema ku rewş ne baş be tenê ji 5 heta 10 nexweşan serdana me dikin.”

‘Ji ber zêdebûna buhayê dermanên penceşêrê em nikarin bikirin’

Ehmed anî ziman ku ew niha zêde nikarin dermanên nêweşiyê penceşêrê bînin ji ber ku gelekî buha bûne û wiha berdewam kir: “Dema berê ji sedî 70’ê dermanên nexweşiyê penceşêrê li ba me hebûn. Lê niha derman ji sedî 30’ biha bûn e û me nikarîbû ku em dermanan bînin. Ji xwe tu rêxistin alîkariyê nadin nexweşxaneyê, tenê Heyva Sor A Kurd rahiştîye barê nexweşxaneyê. Di heman demê de gelek derman buha bûn e, em nikarin peyda bikin. Di vê rewşa dawî de ji sedî 70’ê jî derman li nexweşxaneyê neman e. Dema berê 25 cur dermanên

kîmyawî hebûn lê niha tenê 5 cure mane. Ji ber girtina rêya Şamê em ji aliyê peydakirina dermanan ve gelek zehmetiyan dibînin û ev derman li herêma peyda nabin. Hem jî Ji ber buhaya derman em nikarin bikirin ji ber ku gelekî dermanên penceşêrê buha ne û derfetên me tune ne. Niha jî derman têra hemû nexweşan nakin.

‘Heya derfetên xwe yê dawî em ê alîkariya nexweşan bikin’

Ehmed Hacı di dawiyê axaftina xwe de bal kişand li ser rewşa nexweşan û wiha bidawî kir: “Di aliyê derman de em kêmbûn, ji ber vê em di her alî de xwe digihinî kesa ji bo ku alîkariya nexweşan bikin. Lê belê heya ku dilokek



Gotina Dawî

Kurd di rojeva Cihanê de ne!

Mihemed Seydi

Hefeya duyem a meha Sibatê ya sala 2026’an ji bo Kurdan pêvajoyê nû bû ku derket holê. Li Amerîka pêşeroja Kurdan li Sûriyê hat gotûbêj kirin û li Ewropayê jî li ser giringiya parastina Kurdan dengdan li parlamentoyê hat kirin. Ev mijar piştî êrişên li ser Rojavayê Kurdistanê gelekî girîng bûn. Yê ku di xweştin Kurdan tune bikin, bişkinin û bidin ji birkirin, li diwarên bilind qelîbîn û man sekinin. Çawa ku Keştiya Taytenik li çiyayê Büze qelîbî û tîk çû, plana dewleta Tirk û Ebû Mohammad El-Colanî ya tîkbirina Kurdan tîk çû. Di xweştin ku dengê Kurdan qut bikin, lê Kurd li her deverê bûn lefî û li her deverê derketin û vê ji hişt her kes bi tiştê bi serê Kurdan pêk tê haydar bibe û vê ji gelek siyasîtan dewletan tazî kirin. Ebû Mohammad El-Colanî û li pişt wan jî dewleta Tirk wiha ji xwe bawer bûn ku ji ber tawîz dane Israîlê, ew ê karibin komkujîyan derheqê Kurdan de pêk bînin û wiha derbas bibe. Li ser vê plana Colanî û Tirkiyê, Rêveberê Navenda çavdêriya Mafê mirovan a Sûriyê Ramî EbdîlRehman di destpêkê ve hişyarî da û got ku bela xwe li Kurdan nedin û mijara Kurdan ne wiha ji rêzê ye. Bi vî awayî xwe ceribandî û encam derketin holê. Raste ku dewleta Tirk û DAIŞ’ê û hin erebên ku li pêyî serokên Eşîrên Erebiyê Reqa û Dêrezorê ketin pêyî kuştina Kurdan, lê di dawiyê de yê ku tawîz dan ne Kurd bûn, lê belê Şam bû. Niha ji hîne zêdetir ketine nava tirsê ku carekê din ceza li ser Şamê werin birin, ji ber pir bi zelalî û eşkere li nava siyaseta Amerîka de Kurd bûn rojev. Li aliyê din, di 13’ê vî Sibatê de Mezlûm Ebdî fermandarê QSD’ê û Îlham Ehmed rêveberiya desteya karên derve ya Rojava li Mûnihê derketin pêşîya ekranan û bi gelek bersîrên Ewropî û Amerîkî re civîyan. Ev derketin jî bo dewleta Tirk ku li pişt tunekirina Kurdan e re bû surprîz û ew ne li bendê bûn ku wê hin zêdetir nûneriya Kurdan were qebûl kirin û pêşwazî kirin. Ji her kesên ku digotin vaye Amerîka yan jî Koalîsyonê Kurd û QSD firotin e re bû bersiv. Kurd hevalbendî û hebûna wan li herêma bîngehê ji bo dawîbûna terêrê. Di demê de ku nûnerê Amerîka yê Sûriyê Tom Barack ku wekî berdevkê Tirkiyê û Colanî tevdiqere digot edî rola QSD’ê qediya ye, pêşwazîkirina serokê Franca Emmanuel Mackron jî Mezlûm Ebdî û Îlham Ehmed re bersiv bû ku Kurd bi gotinekê yan jî bi planekê naqedin û ev peywendîya bi Kurdan re ne taktîkî û dem kurte, lê belê stratejîk û demdirêje. Lewma, pir girîng e ku Kurd bala xwe bidin diplomasiyê û zanibin baştir tevbigerin. Herwiha di aliyê ragihandinê de jî divê edî ji qasîlê ku çekirine derkevin û rola Kurdan, daxwazên wan û giringiya wan bi cihanê bidin naskirin. Nabe edî Kurd piştî ewqas bedel û qurbanî bimînin li ber deriyên û bi dizî biaxivin, lê divê diplomasiya wan û ragihandina wan li her derî bide. Her kes divê karê ku li ser milê wî dikeve baş pêk bîne da Kurd nebin qurbana planên pişt diwarên ku derî lê hati girtin. Edî cihan Kurdan pêşwazî dike û divê dezgehên Kurdan jî derdê Kurdan bi zîmanekî zelal bidin bihiştin.

Bi kamîreyê Hemza Sêvo



FERHENG A BIWÊJAN

- Lêva xwe lê xwar kir:**
- Bi heman wateyê.
- Li deveyê siwar bûye û hê kûzekûza wî ye:**
- Bi tiştêkî qayil nabe.
- Mala minî/mala min:**
- Bi serê min neket; min neeciband;
- Malê min e:**
- Ez bi malê xwe razî me; keyfa min ji malê min re tê.
- Me gozek dayê ew du gozan dixwaze:**
- Destpêkê bawer nedikir em tiştêkî bidinê, niha pirtir dixwaze.
- Ne germ lê te ne sar/ne serma lê tê ne germ:**
- Bi tiştêkî qayil nabe; dilê wî bi tiştêkî xweş nabe; tiştêkî qebûl nake.
- Ne sîr e ne pîvaz e qedab li guncikê germ bikeve:**
- Dema behsa çend tişt, yan çend mirovan li bal yekî tê kirin, lê yek tenê jî ne bi dilê wî be wisa dibêje. Yekî tenê jî naecibîne. (32)
- Reşê tu li vir bisekine ezê li gewran bigerim; ku min gewr nedittin tu dîsa reşa min î:**
- Eger ez yekî ji te baştir bibînim ez te naxwazim.
- Silk jî divê kutilk jî divê:**
- Qîma xwe bi tiştêkî tenê nayne; gelek tiştan dixwaze.
- Wî li min daye ew digirî:**
- Wî zerer daye min, lê dîsa ew ji rewşa xwe neqayil e.
- Ya ne ji ti re ji me re:**
- Ka çi nebaş e didin me.
- LI SER BAŞBÛN, BAŞÇÊKIRIN Û JIHEQDERKETINÊ**
- Bi rûn hatiye qelandin:**
- Ya herî baş e; ya herî qenc e.
- Gêre jê çêkir:**
- Pir baş çêkir; pir xweş kir; ji heq derket.
- Kir çirik:**
- Karê xwe pir baş kir; ji heq derket.
- Kir teraf/bû teraf:**
- Bi heman wateyê.
- Kir tembûr:**
- Bi heman wateyê.
- Mijik jê bir/mijik jê birin:**
- Bi heman wateyê.
- Nanê genim e:**
- Pir baş e; pir biqîmet e.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

Bi pêşengtiya Tevergera Jin xebat û çalakiyên gel li Ewropayê bi bandor dibin



Endama Tevergera Jinên Kurd a Ewropayê TJK-E Kezban Dogan da zanîn ku bi êrişên li ser Rojava re li Ewropayê seferberî hat îlankirin û got, “Çawa ku li her derê Kurdistanê jina Kurd pêşengiya şoreşê kiriye, li Ewropa jî di bin siwana TJK-E de jina Kurd pêşengtiyê ji jinên Kurd û Ewropî re dike.” **R-2**

‘Partiya Yekîtiya Suryanî rêbazên leşkerî yên hikumeta demkî red dike’



Endamê Desteya Çibicîkar a Partiya Yekîtiya Suryanî Gebriyêl Şemiûn da zanîn ku ew rêbazên leşkerî yên hikumeta demkî li hemberî gelê Sûriyê red dikin û got, “Hikumeta demkî rê li pêşîya xîtaba kîndariyê û şerê taybet nagire. Divê hemû gelên Sûriyê di amadekirina destûra nû de hevkar bin.” **R-4**

‘Zarok di nav êşên koçberiyê de mezin dibin’



Rêveberê dibistana Ehmed Sebirî, Hesen Werde diyar kir ku ew ji bo zarokên di nav êşên koçberiyê de mezin dibin her roj ji sat 9’ê sibê heya 3’ê êvarê çalakî, şahî, leystok û fêrkirinê li dar dixin. **R-3**

Nasnameya Jîna Azad
Işvan Karadeniz R-2

Yên Li Ber Xwe Didin Zindî Dimînin
İdrîs Henan R-4

Koridorên Enerjiyê, Bazariyên Qirêj û Rojava
E. Pêjder Altan R-6

Yekîtiya gelê Kurd ferz e
Hafîz Ahmet Turhallî R-7

Entegresyon erê, lê hişmendiya çeteyan na
Gulîstan Xalid R-10

Veguhestina DAIŞ’ê; Derbaskirina bombeyekê ji Sûriyê ber bi Îraqê ve

Piştî 10 salan ji şerê koalîsyonê li dijî DAIŞ’ê li Sûriyê, edî bermahiyên wê yên girtî tên veguhestin bo Îraqê. Ev veguhestin jî mîna bombeyekê ku dibe li Îraqê biteqê, divê Başûrê Kurdistanê, PDK û YNK’ê jê re hişyar bin! **R-6**



KOMPLO WERE BIDAWÎKIRIN WÊ PÊVAJO BI SER BIKEVE

27 sal in ku Rêber Apo di bin tecrîdekek giran de ye, tevî berdevambûna sistema îşkence û qirkirinê ya ku li ser Rêber Abdullah Ocalan tê meşandin di 27’ê Sibata 2025’an de, Rêbertî Pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk da destpêkirin. Di bin qeydên tecrîdê de Rêber Apo karîbû zemîna pirsgirêka Kurd ji warê leşkerî veguherîne qadeke siyasî û hiqûqî. Lê eger Komploya Navdewletî neyê bidawîkirin, pêvajoyê bi ser nakeve ji ber ku yek ji mercên serkeftina pêvajoyê azadiya fîzîkî ya Rêber Apo ye. **R-5**



Ji bo parastina daran û qadên kesk semada NPK tê rijandin

Wekî beşek ji hewildanên parastina qadên kesk, Nivîsgeha Park û Darçandiniyê bi rijandina Gubreyê (semad) NPK li ser daran li çend cihan xebata xwe ya meydanî didomîne. **R-8**



Bi pêşengtiya Tevgera Jin xebat û çalakîyên gel li Ewropayê bi bandor dibin

Endama Tevgera Jinên Kurd ya Ewropayê TJK-E Kezban Dogan da zanîn ku bi êrişên li ser Rojava re li Ewropayê seferberî hat îlankirin û got, “Çawa ku li her derê Kurdistanê jina Kurd pêşengiya şoreşê kiriye, li Ewropa jî di bin sîwana TJK-E de jina Kurd pêşengtiyê ji jinên Kurd û Ewropî re dike.”

Esma Mistefa

Tevger û rêxistinên jinên Kurd li Ewropayê bi awayekî herî bi bandor di nava xebatê de ne. Girêdayî xebatê Tevgera Jinên Kurd bi giştî li Ewropayê her wiha ji bi Şoreşa Rojava Berdevka Yekîtiya Jinên Kurd li Almaniya her wiha endama Tevgera Jinên Kurd ya Ewropayê TJK-E Kezban Dogan bersiva pirsên Rojnameya me dan.



Tevgera jin li Ewropayê jî demeke dirêj ve xebatêbn şember ji bo jin û doza gelê Kurd dide meşandin, gelo ast û naveroka xebatê xwe li Ewropayê hûn dikarin binixênin?

Tevgera Jinên Kurd li Ewropayê di sala 2013'an de hatiye avakirin, lê belê beriya wê di sala 1987'an de bi avakirina Yekîtiya Jinên Welatparêzên Kurdistan ku yekemîn Tevegra Jin ya Kurd li Almaniya hatiye avakirin. Ji wê demê û heyanî niha xebatên xwe ji bo jin û doza gelê Kurd dane meşandin û her çûye berfirehtir bûye. Çawa ku berê di bin sîwana YJWK'ê de karê xwe daye meşandin, her wiha dema bûye PAJK û piştre bûye YJK ku hemû jî ji bo yek armancê hatibûn avakirin. Di 2013'an de êdî sîwana xwe ya xwesa a giştî TJK-E dan avakirin û di bin wê sîwanê de li welatan tevgerên xwe birêxistin kirin.

Bi vê yekê niha li Ewropayê, li Iskenderafîya, Siwîrsa, Almaniya, Holanda, Belçîka, Firansa û li Îngelteryayê di bin sîwana TJK-E de xebat tê meşandin. Dîsa li Ewsturaliya, Kanada, Qubrusa Roma û herwiha li gelek cihên din ev xebat tê birêvebirin. Weke ku me aniye ziman xebatê wê girêdayî Kurdistanê bû û di heman demê de torê rêxistinê yê bi jinên cihanî re, rêxistinkirin bû. Di tora rêxistinê de gelek pêşketin çê bûn bi taybet bi Şoreşa Jinê re.

Ji bilî van xebatan TJK-E gelek kampaniya pêş xistin minak (Em ne namûsa tu kesî ne, bedena me ya me ye- Kuştina jin politîk e-Tirêjên rojê- kampaniya komkirina îmzeyan ji bo CPT derbarê rewşa Rêber Apo de, her wiha komkirina îmzeyan ji bo darizandina Erdoxxan derbarê kuştina jinan de) û gelek kampaniyayên nîtalîk hatin pêş xistin. Kampaniya ji bo

Rêbertî gelek deng veda bi deh hezaran kes tevî bûn. Her wiha ji bo banga Rêber Apo ya 27'ê Sibata Banga Aştî û Civaka Demokratîk rolekî sereke me leyist. Çawa ku li her derê Kurdistanê jina Kurd pêşengiya şoreşê dike, li Ewropa jî di bin sîwana TJK-E û sîwanê welatan de jina Kurd pêşengtiyê dike. Her wiha pêşengtiya jinên Ewropî jî dike ku di blatforma de digihîjin hev, hem mijarên Kurdistanê û him jî mijarên doza azadiya jin ji xebatên wê yê sereke ne.

Ji bo Şoreşa Rojavayê Kurdistanê bi rojan e gel li Ewropayê li ser piyane ku vê yekê bandora xwe li ser guhertina dengiyên siyasî û raya giştî avakir, xebatên we yê di vê çarçoveyê de çi bûn?

Bi êrişên 6'ê Çileyê re ku ji Helebê dest pê kir û piştre ber bi giştî Rojavayê Kurdistanê ve hat ku ev êriş ji aliyê HTŞ'ê û komên çeteyan ve hatin destpêkirin. Weke TJK-Ewropa bi lez û bez rewşa awerte û seferberî hate îlankirin. Ez dixwazim vê jî bînim ziman ku em di dema bîranîna her du komkujiyên li Ewropa yê li ser jinên pêşeng hatibû kirin de bûn, ya 25'ê Kanûnê 2022'an. Her wiha 2013'an ya li ser şehîd Sekîne û rêhevalên wê bûn. Dîroka êrişan bi rasthatina dîrok û dema van komkujiyan re ji me re bi wate tê. Bi taybet lidarketina civîna li Parisê û îmkirina wê peymanê li wir, gelek bi wate ye. Ji ber bi sala ye em ji Hikumeta Firansayê hesabdayîna pêkanîna komkujiyên ku pêk hatine de dixwazim. Em vê dibêjin rol û bersiva Firansayê di êriş û kiryarên li ser jin û gelê me de bi taybet di van demên dawiyê de hatine kirin, rolekî eşkere û zelal e. Piştî we qaşo behsa peyman û muzekereyan dike lê belê gavên yekemîn yê komkujiyan li wir hatine destpêkirin.



derê Ewropayê bi seferberiyê re ketê nava xebatê de. di heman demê de me got ku em ê di karê diplomasiyê de xwesa bin lê di xebatên giştî û çalakîyan de bi hemû welat û tevgerên xwe re kar bidin meşandin. Êdî piştî 7'ê Çile li her derê Ewropayê çalaki hatin destpêkirin. Ger em bala xwe bidnê di wê demê de bangkirina Almaniya ya fermî ji bo Colanî hate kirin. Li hember vê yekê berteka gelê Kurd, berteka Tevgera Jin, haştag belavkirin û çalakîyên ku hatine lidarketin her wiha gelê Alman berteka xwe nişan dan; hêşt ku ew ziyareta Colanî bo Almaniya ya 19'ê Çile bê taloqkirin. Lê belê me got ku ev divê bê rawestandin ne ku bê paşdexistin weke ku hûn dibêjin, hev du bikujin piştre em ê hevdiîtinên xwe pêk bînin. Ji xwe rola Ewropa li hember gelê Kurd diyar e, ji roja ku di Lozanê de Kurdistanê parçe kirin, politîkayên wê diyar in. Ji bo wê berteka gelê Kurd li diyasporayê bi taybet li Ewropa, bê hempa bû. Her roj ev sekin tê domandin, heyanî ku aramî ava nebe û statuya Rojavayê Kurdistanê neyê bidestxistin wê ranewestîn. Ji ber ger statu neyê standin wê her tim ev pîlan û êriş bînan domandin weke ku çawa di dîrokê de her wiha kirine.

Bê guman xebatê me ne tenê di asta çalakîyan de hatiye meşandin, di aliyê diplomasiyê û çandî de gelek xebat û têkilî hatin kirin.

Gelo di Ewropayê de we çiqas dikarî li ser raya giştî bi çalaki û xebatên xwe bandorek bida avakirin, her wiha ji bo Rojavayê Kurdistanê ruhekî çawa derket holê?

Li vê derê yekêtiyeke netewî ya yekbûna ruhê gelê Kurd derket holê. Her çar parçeyên Kurdistanê li vir bûn yek. Di 24'ê Çile de li bajarê Kolnê çalaki çê bûn, di nava sê ro-

jan de bi sed hezaran kes daketin meydanan. Di wan çalakîyan de ne tenê gelê Kurd hebûn, dosênê diplomatîkê de xwesa binê Kurd li cihanê her wiha kesên ku xwe ji Şoreşa Rojava re berpirsyar didîtin derketin. Di heman demê de tevger û kesayetên Homanîst, Komünîst, Anarşîst, Sosyalîst û Faminîst jî derketin. Ji bo wê yekê mirov dikare bibêje, pîlan û projeyên ku li Parisê hatine kirin, bi berteka gelêkê birin.

Hêjayî bîrxistinê ye ku ji aliyê Kovareke Almanî ya herî bi nav û deng nivîsek derbarê Ew rojava jina Kurd ya ku ji aliyê serçeteyekî ve hatiye bîrîn, hat belvkirin. Ev nûçe bi naveroka ku di mejiyê mirovan de nakodîyan bide çêkirin, derket. Weke ku ew por nehatiye jêkirin, ew por ne rast e û ne xwezayî ye. Sernivîsa wê ji wiha bû (Çawa mirov dikare bi keziyêke derewîn, cihanê biguherîne) bû. Weke ku ew zilam jî rêzê ye, ew çûye xweringehêkê û ew kezî li ser masê dîtiye, yanî ew çek û rexta li ser wî nedîtine, gotinên wî di wê dimenê de nedîtine. Xwestin tê de QSD'ê tewanbar bikin û wan çeteyan weke ku gelek paqij in û demokratîk bidin derxistin.

Ji bo wê yekê me dest bi xebatê xwe kiriye, li ser medya dijîtal me haştag belavkiriye. Di aliyê hiqûcî de em kar dikin ku em çawa rastiya vê kovarê ya ku bi dîjberiya xwe li hember gelê Kurd û nûçeyên derewîn dixwaze rastiya biguherîne, derxistin holê û dozê lê vekin. Em vê meji û hişmendîya baviksalar baş nas dikin, dixwazim HTŞ'ê bi awayekî demokrat derxistin holê.

Li Ewropa çalakîyên girseyî li hember hemû cureyan tê domandin. Her wiha wê di 14'ê Sibata de ji bo komploya li ser Rêber Apo de wê çalaki bînan lidarxistin wê di bin dirûşmeya “Ji Rêber Apo re azadî û ji Rojava re statu” wê bînan lidarxistin.

Akademiya Jineolojî



Nasnameya Jina Azad

Îsyar Karadeniz

Peşya azadî yê ku cara yekem di tableten Sumerî de bi şeklê jinên li ser çiya hatiye xêz kirin û bi peşya Amargî di wateya vegera cewher û dayikê hatiye bi nav kirin ji me re gellek tiştan dibêje. Nasnameya jinê azad çî ye û li ser kîjan esasan pêk tê Rêber APO pênasayek Wiha tîne ziman: “Azadiya jinê, cewhera rizgariya çînî, qewmî û olî ye. Ji ber vê yekê, min li navenda projeya xwe ya azadiyê, projeya azadiya jinê bîchî kir û weke xebata herî giranbûha dît.”

Di name ya xwe ya ji bo jineoloji de jî Rêbertî tîne ser ziman êdî ev proje bi jineoloji ve gihîştîye encamê û êdî dive were pratîk kirin. Bi Nasnameya jina azad xwe zana kirinê, xwebun û vegera cewherê xwe ve misoger dibê. Mina peşya Amargî yê, di serî de wek Ş. Zilan û bi hezaran jinên ku di çiya û deştan de ji bo nasname xwe ya jin û civakê têdikoşin şember dibê. Jina azad jinên ku her cure sepandinê pergala mîr dewlet red dike û di nasnameya xwe ya jinê de her tim bi îsrar dîji û dide jiyin.

Rêber Apo ji bo şember kirina xwebuna jinê hevşengîya hebûn, xwebun û têşe girtinê anî ser ziman û 5 rêgezen birdoziya rizgariya jinê pêşxist. Bi rêgeza yekemîn a welatparaziye wê jin girêdanbuna xwe ya bi ax û welatê xwe dike bingeha hebunê, bi rêgeza duyemîn a vîna azad û fikrê azad ve pêşxistina aqlê jin û xwebun û bi rêgeza sêyemîn a rêxistin kirinê ve saz kirin û mayinde kirina vî û jî bo parastin û xwedî lê derketinê van nîrxên ku hatin avakirin jî têkoşin kirin û herî dawî jî bi pîvanên etîk û estetîkê ve hunandina van rêgezan ve têşe girtina formula efsunî ya jin, jiyana, azadî ve nasnameya jina azad were afirandin.

Di vê nuqteyê de, analîza Rêberê Apo a li ser jinan rênîşanek peyda dike. Gotinên wî yê li ser têkoşina jinan a ji bo azadiyê ev in: “Rastiya kolektîf a cewhera gerdûnî tevgera jinan e,” û dîsa, “Jin gerdûn bi xwe ye; mîr jî wê dîrketinê e, gerêstêrêk dîrketiye. Jin, e ku yekem car ziman çêkir da ku bi zarok re bi-axive. Jin, e ku çandê hildiberine. Jin, e ku zayîna civakê gengaz dike. Pirozî û xwedayî aidî wê ne.” Ev gotin balê dîkîşin ser navnişana têkoşinê hevpar li dijî tariya kuma reş a zihniyeta serdest a mîran ku jinan dîkîşin hundur. Li dijî zihniyeta gerdûnî ya serdest a mîran ku jinan feda dike û bi awayekî sîstematik paşguh dike, jinan di tevgera rizgariya jinan de serdema yekîtiya kolektîf, ku bi rêya jineolojiyê kûr bûye, da destpêkirin. Jinan di serdemê ku bi têkoşinê dest pê kir de, gavên yekem ber bi Xwebunê ve avêtin, ku prensibên jinan temsîl dike. Ji bo jinan, gihîştina Xwebunê tê wateya gihîştina evîn û rastiya azadiyê. Prensîba bîngêhîn di evînê de ew e ku jin xwe bigihîne Xwebunê û wîna neke. Ev tam ew serdema ku sembola şoreşa jinan, avakirina civakê demokratîk û hevgerîna felsefeya “Jin Jiyan Azadî” ye.

Trump keştiya duyem a balafiran dişîne Rojhilata Navîn

Wezareta Şer a Amerîkayê (Pentagon) ragihand ku ew ji bo bîchîkirina keştiya duyem a li Rojhilata Navîn amadehiyê dikin.

Navenda Nûçeyan

Ev pêngav di demekê de tê ku îdareya Donald Trump zextên xwe yê li ser Teheranê zêdetir kirine da ku wê neçarî îmkirina peymaneke nû ya li ser bernamaya nukleer bike.

Li gorî agahiyên sê berpirsên Emerîkayî ku ji rojnameya Wall Street Journalê re axivîne, Pentagon ji bo îhtimala êrişeke leşkerî ya li Îranê amadehiyê dike, heger dan û standin bi ser nekevin. Sêşemê, Serokê Emerîkayê Donld Trump ragihand ku ew şandina keştiya duyem a balafiran a ji bo herêmê dinirxînin û amajê pê kir ku di be ku fermana fermî tenê di nava çend demjimêran de derkeve.

Amadehiyên leşkerî

Berpirsan diyar kir ku eger biryar were dayîn, keştiya şer a “USS George H.W. Bush” ku niha li qeraxên Virjîniyayê rahênanan dike, dê were şandin û di nava du heftayan de bigihe cihê armancê. Ev keştî dê tevî keştiya balafiran a “USS Abraham Lincoln” bibe

ku niha li herêmê ye.

Adara 2025'an jî ji bo operasyonên li dijî Husiyên Yemenê du keştiyên balafiran ên Emerîkayê li Rojhilata Navîn hebûn.

Dan û standin an bijardeya leşkerî?

Ev bipêşketinên leşkerî piştî civîna çarşemê ya Donald Trump û Serokwezîrê Îsraîlê Benjamin Netanyahu ya li Koşka Spî tîn. Trump piştî civîna di daxuyaniyêke li ser medyaya civakî de got: “Min tekezî li ser berdewamiya dan û standinên bi Îranê re kir da ku em zanibin peyman çêdibe yan na. Min jî Netanyahu re ragihand ku bijardeya me ya yekem peyman e lê heger nebe, divê em li benda encaman bin.”

Tevî zêdekirina hêzan û pergala parastina asmanî yê li herêmê, Trump ji rojnameyê re got: “Wextê me yê zêde heye û em ne bîlez in, niha dan û standinê me yê baş bi Îranê re hene.”

Piştî ku Trump nivê meha kanûna paşin a borî biryara êrişê li Îranê rawestandibe jî, li gorî medyaya



Emerîkayê, wî jî artêşa welatê xwe daxwaza bijardeyê “biryardartir” kiriye da ku di qonaxa paşerojê de miameleyê bi Teheranê re bikin.

Xalên sereke yê nakokiyên di navbera Trump û Netanyahu de li ser danûstandinên Îranê çî ne?

Netanyahu hewl dide ku danûstandinên di navbera Washington û Teheranê de berfireh bike da ku bernamaya mûşekên

balîstîk a Îranê jî di nav de bigire, di heman demê de Trump bi eşkereyî biryar nedaye ku çarçoveya danûstandinan berfireh bike, tenê nişan dide ku îhtimala niqaşkirina mijara mûşekan heye. Îsraîl jî rêkeftineke nukleerî ya sinorkirî ditirse ku tenê li ser dewlemendkirina uranyumê bisekine û xetên xwe yê sor ên din paşguh bike, di heman demê de Washington rêbazeke ku pêşî li ser kontrolkirina bernamaya nukleerî ya Îranê di astên dewlemendkirina

aştiyane de disekine red nake. Îsraîl dixwaze ku her rêkeftineke bidawînanîna piştgiriya Teheranê ji bo alîgirên wê yê li herêmê, wek Hizbullah Lubnanî, Hûsiyên li Yemenê û komên çekdar ên alîgirên wê li Iraqê di nava xwe de bigire, lê Washington niha tenê li ser mijara nukleerî disekine herwiha pabendbûnek zelal nişan nedaye ku peymanê bi tundî bi mijara alîgirên herêmî ve girêbide.

Siûdiyê û Somaliyê ji bo hevkarîya leşkerî lihevkerinek îmze kirin

Navenda Nûçeyan

Ji bo xurtkirina hevkarîya di warê parastinê de di navbera Siûdiyê û Somaliyê lihevkerineke hevkarîya leşkerî hat raghandin.

Somaliyê û Erebiştana Siûdî piştî îmkirina muzekereyêkê ji bo xurtkirina tîkiliyên leşkerî û ewlehiya herêmî derbasî qûnaxeke nû ya hevkarîya parastinê bûne, ev yek li gorî daxuyaniyên fermî yê ku ji hêla her du hikumetan ve hatin raghandin, hat diyar kirin. Lihevkerina hevkarîya leşkerî ya di navbera Wezîrê Parastina Somaliyê Ehmed Moallim Fiqî û Wêzirê Parastina Erebiştana Siûdî Emîr Xalid bîn Selman de hate îmkirin. Lihevkerin ji aliyê Wezareta Parastina Somaliyê ve li ser medyaya dijîtal X'ê hate raghandin. Wezarete da zanîn ku lihevkerin wê hevkarîya di warê parastina navbera her du welatan de xurt bike.

Lihevkerin di 9'ê Sibata 2026'an de ji hêla berpirsaryên peybilind di Wezareta Parastinê ya Somaliyê û Siûdiyê hat îmkirin. Ev lihev-



kirin veyhurandineke îstratîjîk a girîng di siyaseta Somaloyê ya parastinê nişan dide. Di heman demê de rola ewlehiya Siûdiyê di Qoça Efrîqiya û herêma Deryaya Sor de destnişan dike.

Çarçoveya îstratîjîk û herêmî

Lihevkerin piştî ku Îsraîlê Somalîland nas kir, Somaliyê vê yekê weke bînpêkirinekê ji serweriya xwe dibîne. Li gorî analîstan, Erebiştana Siûdî piştgiriya xwe ji bo

Efrîqayê, ji ber cihê xwe yê stratejîk ê di navbera Behra Sor, Okyanûsa Hindê û Kanala Siwê de dibe sedema reqabeta di navbera welatên Kendavê de.

Mîrnişînên Erebi yê Yekbûyî tîne pişketî dabîn bike, bi armanca bî-sûdarkirin ku çekan dide hêzên çekdar ên li Sûdanê, di heman demê de jî li Bendera Berberayê bi sed milyon dolaran îstîsmar kiriye û li herêmê hebûna xwe ya leşkerî xurt kir. Erebiştana Siûdî jî hevalbendê xwe yê berê Abu Dabiyê bi taybetî ji ber politîkayên Sûdan û Yemenê bi tundî rexne dike.

Rageşya di navbera her du welatan de li gel bombekirina sewqiyateke çekan ya tî gotin ku ji Mîrnişînên Riyadê ber bi Yemenê ve diçû, derketibû asteke şer û pevçûneke eşkere.

Bendên sereke yê hevkarîyê

Piştgiriya teknîkî û lojîstîkê: Wê Siûdiyê alavên leşkerî û teknîkên parastinê ji bo piştgiriya hewildanên Somaliyê di dabînkirina warê hewayî û xurtkirina serweriya wê ya herêmî, bike.

derbas dike. Lihevkerin li ser çar mijarên sereke disekine: Avakirina kapisîteyê û perwerdeyê: Ji bo hêzên Niştîmanî yê Somaliyê wê Siûdiyê bernamayên leşkerî yê pêşketî dabîn bike, bi armanca bî-lindkirina amadebûna paratîkî, xurtkirina mekenîzmeyên fermanariyê û baştirkirina standanê pişeyî. Ewlehiya deryayî: Her du alî wê ji bo xurtkirina ewlehiya Deryaya Sor û Kendava Edenê hevkarîyê bikin, bi balkişandina li ser parastina dergehên keştewaniyê yê navdewletî ji qaçaxtiya çekan û çalakîyên ne qanûnî.

Li dijî terorê: Lihevkerin xurtkirina parvekîrîna agahiyên îstixbaratî herwiha hevahengîya hevbeş ji bo li hember tevgerên ciwanan bisekinin û ji xeynî wê ji gefên çekdarî li Somaliyê û herêmê, di hewine.

Piştgiriya teknîkî û lojîstîkê: Wê Siûdiyê alavên leşkerî û teknîkên parastinê ji bo piştgiriya hewildanên Somaliyê di dabînkirina warê hewayî û xurtkirina serweriya wê ya herêmî, bike.

Gelo roja qiyametê nêzîk bûye?

Volqan Elî

Me dixwest bersiva vê pirsê bi neyînî bidin. Lê mixabin îşaretên niha li ser erdê xuya dibin zêde alîkarî nadin me.

Mijar yan jî pirsgirêk çi ye? Di rojên me yên dawî de kî dikeve înternetan an jî berê xwe dide ekranên televizyonan bi mijarek ku madeyê mirovan dixelîne û dinyaya mirov ya manewî reş û tarî dike re rû bi rû dimîne: Dosa-ya Epistein... Epstein wilo bû, Epistein çilo bû!.. Bi rêveberiya vî zilamî di cezîreyekê de wekî cihê gerûgeştê cihek tê çêkirin. Li wê derê bigire jî xwarina goştê mirovan heta bi destdirêjîya li zarokan, gemar û qirêjîyek nayê bîra mirovan ji bo zewqûsefaya çend dewlemendan tê meşandin. Ji niha de çendîn kesên bi vê qirêjîyê bûne yên di nava desthîlatdariya Ewrûpa û dewletên cuda de îstîfa kirin. Ji Barrack bigire heya navê Davutoğlu, Erdoğan... derbas dibe tê de. Mînak navê Barackê min û te bi temamî pênc sed (500) caran derbas dibe. Di bernamayeke înternetê de dibêje,

“Barack ji Epistein re dibêje, ji min re zarokan bişîne”. Dîsa li gorî wê bernameyê Barrack dostê herî baş ê Epistein bûye. Jixwe Barack ji bo ku van zarokan li bexçê gulan bigerîne nexwazel! Eger tu li bernameyên înternetê yan jî li ekranê telvizyonan binêrî tu yê rîya mala xwe jî wenda bikî. Na, em wê nabêjin! Di bernameyên li van cihan têne çêkirin de hin rastî hene, lê ne hemû. Hin rastîyan dibêje, temam. Dîsa jî mirovan bi temamî sergîhayî nake.

Eger ev mijara Epistein bi temamî ne projeyeke rêxistinên îstixbarî

be, eger wisa jî be encam nayê guherîn, wekî sê olên ezmanî (Musewî, Îsawî û Îslam) dibêje, roja qiyametê nêzîk bûye! Ma çima nebe, Xwedayê mîhrîban û dilovan ne ji bo ku mirovên wekî Epistein dem û dewrana xwe tê de bigerînin, دنیا û heftê û heft hezar alem afirandiye!? Angu em ê rastî û heqîqetê ne tenê li internet yan jî telvizyonan bibînin, di nava rûpelên dîroka mirovahiyê û dîroka olan de hê baştir bibînin. Kêm maye tiştê ku bi serê bajarên Sodom û Gomora hatî, yanî qiyamet, were serê dinyayê.

Li gorî wê dîrokê em dibînin ku çi bi serê dinyaya wê serdemê hatiye: Serdem serdema Hz. Îbrahîm e. Îbrahîm ji mêj ve ji Rihayê mişaxtiyê welatê Kenan bibû. Xwedayê mîhrîban di cih de dîtibû ku Hz. Îbrahîm li van erdan qebîleya Îbrahîm konên xwe zêde kir û navê Xweda li dinyayê belav kir. Lê zêde di ser re neçû, di ber vê re mirov, êl û eşîr, qebîle û bajaran rû lê kirin ku ji rîya Xweda, heq û heqîqetê derkevin. Ji nav van du bajaran hebûn ku bi nav û deng bûn: Sodom û Gomora... Li van her du bajaran bigire ji fitne û fesadê, dizî û talanê, heta bi destdirêjî û têkîliya cinsî ya di navbera zilaman de ketibû her deverê û şûna exlaq, rêz û hurmetê girtibû. Derew û îxtîkarê, pûtperestiyê şûna heq, heqîqet û Xweda girtibû. Xwedayê dilovan biryara xwe dabû ku xezeba xwe bişîne ser van herdu bajaran. Li ser vê yekê banî Hz. Îbrahîm kir da ku wî agahdar bike: Lewra malbata Lûtê kurê Harran li van bajaran yekî dijîya.

Dem di ser re neçû, firîşteyên

Xweda agahî dan Îbrahîm. Hz. Îbrahîm xwe gihand hizûra Xwedayê mîhrîban. Îbrahîm tije dil bi rehm bû. Ruxmî her tiştî nedixwest xezeba Xwedayê dilovan li van bajaran biqelibe û ji Xweda re got; “Ya Rab eger li vî bajarî pêncî kesê bawermend hebe ma tu yê dîsa bikî qiyamet”. Xweda dibêje; “eger pêncî kesên bawermend hebe ez ê xezeba xwe neşînim û nekim qiyamet”. Hz. Îbrahîm difikire ku ewqas kesên bawermend û salih di nava mirovan de nemane. Lewra ji Xwedayê heftêûheft hezar aleman re dibêje; “na eger çil kesên bawermend û salih mabin ma dîsa tu yê bikî qiyamet?”. Bi vî şiklî Hz. Îbrahîm dadikeve heta bi deh kesan. Ji Xwedayê xwe dipirse ku 10 kesên bawermend û salih li bajêr mabin ew ê dîsa bike qiyamet yan na!

Xwedayê mîhrîban ji Hz. Îbrahîm re dibêje, “eger 10 kesên bawermend û salih mabin ez ê nekim qiyamet”. Îbrahîm jî hizûra Xweda dûr ket û berê xwe da welatê xwe. Li van bajaran li yekî (Sodom yan jî Gomora) Lût, kurê Harran (Harran birayê Hz. Îbrahîm e) û malbata xwe dijîya. Xweda ji bo ku biceribîne, du firîşteyên xwe di cismê du xortên lihevhatî de dişîne vî bajarî. Ev herdu firîşte li mala Lût dibin mêvan. Zaxran û enterên jî rêderkefî yên Sodom (yan jî Gomore) wan dibînin ku ew çûne mala Lût. Bê exlaq û tolazên bajêr didin pey hev û ji bo ku destdirêjî lê bikin herdu firîşteyan ji Lût dixwazin. “Ji ser wê yekê me, karê me bi wan heye!” Lût dibîne ku niyeta wan xirab e, ji wan re dibêje; “binêrin,

tiştê ku hûn dibêjin ne di olê me de û ne jî di exlaqa me de tine. Du keçên min ên ciwan hene, destê ti zilaman bi wan neketiye. Li şûna her du xortan, ezê herdu keçên xwe bidim we”. Lê ji rêderketiyên Sodom (yan jî Gomora) vê qebûl nakin! Ji Lût re dibêjin, “tu dixwazî me bixapînî. Em ê çi ji keçên te bikin, em bi wan xortan hewce ne!” Xweda çavên wan kor dike û ji ber vê nikarin deriyê mala Lût vekin: Ji wan her du firîşteyên xwe re aşkere dike ku ji Lût re bêjin, “her kî be mirovên bawermend û salih bide pey xwe û bêyî ku li pey xwe binêrin berê xwe bidin çiya û terka bajêr bikin”. Lê mixabin Lût ti kesî salih peyda nake, ji bilî hevsera xwe û du keçên xwe yên ciwan.

Di encamê de ji ezmanan kurkut û agir dibare, erd diqelişe û bajarê ji rê derkefî di nava agir û pêtê de tine dibe. Lût bi hevser û du keçên xwe re berê xwe didin çiyê. Lê belê hevsera Lût dilê xwe bi bajêr dişewitîne û li xwe vedigere lê mêze dike. Di cih de dibe teht û zinarekî ji xwê. Lût û du keçên wî yên ciwan bi rênişaneriya Xweda rizgar dibin! Cîhana me ya îro, ma naşibe bajarên Sodom û Gomora ku Xweda li wan hatibû xezebê!? Vê ne tenê em dibêjin, sê milyon belgeyên dojeha ku Epistein ava kiribû îfşa dikin, ku ev tenê goşeyekî biçûk ê vê dojehê ne. Jixwe qet ti kes nikare zilamên Epistein û dojeha wî biparêze. Lê belê rewşa cîhana me ya ku ji bo dojeha Epistein û hezar gunehên din bê deng dimîne dişibe rewşa hevsera Lût!

Entegresyon erê, lê hişmendiya çeteyan na
Gulîştan Xalid
<div>Di êrişa şeş çileyê de ku ji aliyê çeteyên HTŞ û çeteyên girêdayî dewleta Tirk ve li ser Rojavayê Kurdistanê pêkhat , me careke din dît ku bi rîya van çeteyan hêzên komploger li aliyekî êrişî gel dikin, komkujîyan pêktînin û nijadperesiyê dikin, li aliyeke din li hemberî jin jî bi awayeke taybet kiriyarên hovane û bê exlaq pêş dixin. Di van êrişên çeteyan de em dîsa bûne şahidê hişmendiyeke ku hefnikî girîye û hêseke mezin li hemberî jina Kurd dijîn. Çima ev hêrs û çima bi taybet jina Kurd; Jiber di van salên şoreşê de jin di her alî de rola xwe leystîin, di warê parastin, di qada siyasî, civakî û diplomasi de, jin meclis û rêveberiyên xwe di hemû qada de bi rêxistin kirin. Ev jî hêzbûyîna civaka ku bi pêşengtiya jin ve şoreşê pêş dixe dida nîşandan. Weke mînaka Hevrîn Xelef hevseroka Partiya Sûriye Pêseroj ku di dema sala 1919 de êrişên li ser Serêkaniyê û Girê Spî bi destên çeteyan bi awayeke hovane hate qetil kirin, li Şêxmeqsûd jî bedena jina servan ku ji cihêke bilind ve hate avêtin û li Reqa jî jineke servan ku piştî şehid dibe kezîyê wê hate jêkirin, dide nîşandan ku ev çeteyên wekîl û berdevkên hêzên komploger çiqas bertekêke zaniştperest bi qilîfêke olî, moderin û nijadî xwe pêçandine li hemberî azadiya jinin, civakê ne .</div>
<div>Li gorî wan çeteyan û vê hişmendiya kufikgirtî gereke jin tu car azad nebe, jin were mullkirin, firotin, mejiyê xwe bikar neyne, dengê wê demekeze, rûyê wê xuya nebe, vîna xwe nebe...û hwd. em bi hişmendiyeke ku dixwaze pêşketina civak û jin paşve vegerîne û jiyaneke rezil û rizyayî dîsa li ser civakê bi hovîtî ferz dikin. Bifikirin ku ew HTŞ ku niha li ser deshîlâtdariya sûriyeyê û jê re dibêjin deshîlâtdariya demkî ne tenê dixwaze Sûriye di warê siyasî bi deshîlâtariyê kekeze be, dixwaze ku hemû civakên di hindrê Sûriye de veegerîne jiyana çaxên navin û xirabtir jî. Ev hişmendî îro xeteriyê pir ciddiyê jî bo tevayî gelê Sûriyeye. DAÎŞ ku jî Sûriye hate paqijkirin bi HTŞ re dîsa zindî dibe. Ji mirov re wiha tê ku DAÎŞ rewabûna xwe bi naveke cûda derdixe pêş. Civaka Kurd li Rojava bi tenê jî bimîne ewê teslimî vê hişmendiyê nebe û heya ku ferdex xwe hebe jî ewê li hember vê hişmendiyê di hemû waran de têkoşin bike. Gel xwedî vê sozê û vê seknê ye. Gelê Kurd ne li hember Entegresyonê ye, û tu pirsgirêka gel ku bi gelên heremê re jîyan bike tuneye ku ji xwe heya niha jî wiha bûye, tu carî gelê Kurd bi tenê di erdingariyekê jîyan nekiriye. Hêrsa gel li hemberî hişmendî û kiriyarên çeteya ya li hemberî jinan zêdetir bilind bû û israra wê ya berxwedanê jî bi wan dimenan re zêdetir derkete pêş. Jiber ev civak azadiya xwe di azadiya jin de feam kiriye û jî bo vê civakê jin pîroze. Elbette gelê Kurd di tevayî Sûriye de rola pêşengtiya siîstema demokratîk û Sûriyeye demokratîk ku bi hemû pêkhateyên xwe ve armanc digirt girte ser milê xwe, ji bo wê jî gelek bedel da. Gelê ku xêrxwaziya hemû gelan dixwaze îro bi tenê jî bimîne ewê dev ji armancê xwe bemele, lê rastiyeke wiha heye, mîna ku Gandî dibêje: ger ku xencer di pišta te debe tu ancx bi derxistina vê xencerê re destpêkê mijûl bibe. Îja weke wê minakê di rewşa heyi ya li Rojavayê Kurdistanê û civaka Kurd de jî tê jîyan kirin. Ger ku xencer di pišta wê de be û heya ku vê xencerê jî pišta xwe demexe ewê nikaribe xencara di pišta havirdorê xwe de jî derbixîne. Ev xencer ewê ancx bi berxwedanî, yekîtiya gelê Kurd û pêşengtiya jinan ve were derxistin. Ji lewma gel bi sekna xwe jî îfade dike ku ew ne li dijî entegresyonê ye, ew jî hişmendiya çeteyan re dibêje na û di hişmendiyeke azad de bi israre.</div>

Çavên wê xwe bi xwe ve girê dide

‘Azadiya fîzîkî ya Rêber Apo, azadiya hemû gelan e’

Endamê Koordînasyona Parêzerên Sûriyê ji bo Azadiya Rêber Apo, Cebrail Mistefa diyar kir ku banga Aştî û Civaka Demokratîk salek li ser derbas dibe, lê heya roja îro tu gavên cidî ji aliyê dagirkeriya Tirk ve nehatiye avêtin û got, “Divê yekîtiya Ewropa û CPT bi erkên xwe rabin, pêwîst e dewletên Navnetewî zextekî li ser dewleta Tirk bide çêkirin, da ku Rêber Apo fizîkî azad bibe.”

Viyan Egîd/Qamişlo

Di 27`ê Sibata 2025`an de Rêber Apo deriyeke nû ji bo çareserîya Kurd û avakirina Tirkîyeke azad û demokratîk vekir ku Kurd û hemû netweyên din bikarinbin tê de bi aştî û azadî bijîn, banga Aştî û Civaka Demokratîk kir. Pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk hîn neghiştiye wê asta ku di jîyan û cihê Rêber Apo de guhertin çêbibe, ango di derbarê jîyan, azadiya fizîkî û mafê hêviyê de gavên piratîkî nehatine avêtin, dewleta Tirk a dagirker heya roja îro vê pêvajoyê bi awayekî cidî nagire dest, ji bo ku ev pêvajoy bighîje serî, pêwîst e di destpêkê de azadiye Rêber Apo ya fizîkî pêk bîne. Di vê çarçoveyê de Endamê munesiqiya parêzerên Sûriyê jî bo Azadiya Rêber Apo, Cebrail Mustefa ji Rojnameya me re axivî.

‘27 salin ku li ser Rêber Apo zext û tecrîdeke giran tê meşandin’

Cebraîl Mustefa di destpêka axaftina xwe de diyar kir ku di 15`ê Sibatê de Kombîloya Navnetewî ya li ser Rêber Apo hat meşandin û Rêber Apo dîl hat girtin û ev derbasî sala 27`an bibe ku ew dîl hatiye girtin û wiha pê de çû:

‘Zarok di nav êşên koçberiyê de mezin dibin’

Bîrûc Resûl/Qamişlo

Rêveberê dibistana Ehmed Sebirî, Hesen Werde diyar kir ku ew ji bo zarokên di nav êşên koçberiyê de mezin dibin her roj ji sat 9`ê sibê heya 3`ê êvarê çalakî, şahî, leystok û fêrkirinê li dar dixin.


di nav 14 sal jî şer û kirizên li Sûriyê derbas bûn, gelek kiryar û sûcên dijmirovî hatin qewimandin, kuştin, revandin, talankirin û koçberiya bi darê zorê ru dan. Ev hemî jî li ber çavên zarokan çêbûn. Li vir jî gelek zarok bûn qurbanên şer, hin jî van zarokan aliyê derunî de hatin tune kirin. Di nava koçberiya herî dawî de ku malbatên Efrîn, Şêxmeqsûd, Eşrefiyê û kantona Fîratê koçber bûn û berê xwe dan kantona Cizîrê, gelek malbat û zaroka heya roja îro nehatine bicih kirin, her wiha li dibistan,

“Di 15`ê Sibata 1999`an de bi kompoyekî Navneteweyî Rêber Apo bi awayekî bêbext hat dîl girtin û ev bû 27 sal ku Rêber Apo di nava zext û tecrîdeke giran de tê girtin. Ji ber vê yekê em vê komployê bi tundî şermezar dikin, ev komplo ne ten di şexsê Rêber Apo de bû, lê belê kompoyek li ser tevahî gelê Kurd e ku dixwestin gelê Kurd qir-valet bi heman demê de gelê Kurd di komkujîyan re derbasbikin. Lê li hemberî ewqas kiryar û sûcên dijmirovî yên ku têne meşandin jî Rêber Apo roj bi roj asta têkoşin û berxwedanê mezitir kir, ev yek hişt ku gelê Kurd daxwaza mafê xwe yê rewka bike û berxwedaneke bîhempa bide meşandin. Herwiha Rêber Apo karîbû projeya Netewa Demokratîk pêş bixe, ev yek bû sedem ku doza Kurdî di Rojhilata Navîn de deng bide.”

‘Salek li ser banga Aştî û Civaka Demokratîk re derbas dibe’

Cebraîl di berdewamiya axaftina xwe de balkişand ser mafê hêviyê û azadiya Rêber Apo ya fizîkî û wiha got: “Di 27`ê Sibata 2025`an de ji aliyê Rêber Apo ve banga Aştî û Civaka demokratîk hat ragihandin, ev bangewaziya Rêber Apo ji

salên 90`î ve daye pêş ku ev bang ji bo tevahî pirsgirêkên Rojhilata Navîn çareserîye, lê çima ku ji aliyê Rêber Apo ve dihat pêşkêş kirin dewleta Tirk qebûl nedikir. Lê di vê dawiyê de dema ku Rêber Apo banga Aştî û Civaka Demokratîk ragihand, destpêkê dewleta Tirk ev bangê erînî dît ku ev bang wê çareseriyê bi xwe re bîne. Niha jî bikin, di heman demê de gelê Kurd di komkujîyan re derbas dibe. Lê li gor vê bangê çî qewimî? Me teva dît ku çawa dewleta Tirk heya niha tu gavên cidî neavêtîye, ji bo banga Rêber Apo Kurdan her gav avêt da ku aştî pêkwere. Dewleta Tirk şûna ku pirojeya Aştî û Civaka Demokratîk pêk bîne, diçe piştgiriyê didê komên çete yên li Sûriyê ku qirkirin û Komkujî pêk nedan ku doza Kurdî di Rojhilata Navîn de deng bide.”



Niha jî em dibînin ku salek li ser banga Rêber Apo derbas dibe, lê heya roja îro mafê hêviyê ji Rêber Apo re nehatiya dayin, ev bi xwe didîe diyarkirin ku dewleta Tirk ne di gor qanûn, destûr û exlaqan tevdigere. Mînak em bidin ku ji bo kesekî normal nabe zêdeyî 25 salan di girtîgihê de bimîne, çawa ku Rêber Apo feylesûfêkî mezine û tu sûc nekiriye, tenê ji bo doz û mafê Kurdan xebitî, ev ne sûce ku heyanî îro di girtîgihê de tê girtin û mafê hêviyê ji bona wî nayê dayîn. Ji bona vê yekê pêwîste mafê hêviyê û azadiya Rêber Apo ya fizîkî were pêkanîn.”

‘Dewleta Tirk ne li gor zagon û exlaq tevdigere’

